



UPOTUDAK

ULUSLARARASI POLİTİK TUTSAKLARLA DAYANISMA KOMİTESİ
INTERNATIONALE SOLIDARITÄTSKOMITEE MIT DEN POLITISCHEN GEFANGENEN
INTERNATIONAL SOLIDARITY COMMITTEE WITH POLITICAL PRISONER
COMITE INTERNATIONAL DE SOLIDARITE AVER LES PRISONNIERES POLITIGUES

Ji bo Abdûllah Gurlek û Vedat Yeler Azadî!

Cînê serwer, li dijî tevgerên gel û serhildanên ku di çapanên cîhanê de tîndî jiyandin bi polîtîkayên nîjadperest, faşîst ve partî û komên li dijî jin û koçberanin xurt dikin. Ev polîtîkayên ku di serî de cîhê pir baş tîndî sepandinê "landîka demokrasîyê" Ewrûpa ye. Emperyalîstên Ewrûpa di aliyek de gotinên "demokrasîyê," "mafên mîrova" ji devê xwe dernaxin, di aliyek din de jî mînak wekî Komara Tirk êrîşên dagirî li Rojava kir, piştgirî didin êrîşên dagiriyê. An jî deng li "şantajê koçber"ên faşîst R.T Erdoğan dernaxin.

Bi taybetî ji bo polîtîkayên li dijî koçberan, dewleta Yewnan li cem emperyalîstên Ewrûpa li cîhek taybet de disekine. Bi Komara Tirk ve hebûna sînorê dewleta Yewnanîstan pêkve li arasteyî koçberan rê ya zêde bûna êrîşan û derketina qanûnên nû ku di naverokê de maf çopandin hene vekirî ye. Bi taybetî bi demezirandina hikûmeta Demokrasiya Nû ve li arasteyî koçberan êrîş pir zêde bûn e. Ji aliyê polîsên Yewnan ve koçber tîndî sepandinê, cîhê ku koçber dimînin malên dagirî ser lê tê girtin û bi zorê tîndî valakirin.

Di van mehên dawîn de jî îşkence li arasteyî koçberên ku ji Tirkiyê derbasê Yewnanîstanê bûne hatiye kirin di rojevê de ye û tê zanin li gelek kesan îşkence hatiye kirin û hatine paş şandinê. Û dîsa mîrovên polîtîk bi van sedeman ve ji ber pêkutên faşîst dijwar dimînin ji Tirkiyê derkevin. Ev mîrov ji aliyê polîsên Yewnan tîndî binçav kirin û piştî binçav kirinê bi awayek bêqanûn dersînorî û radestên dewleta Tirk a faşîst dikin. Yewnanîstan û raya Ewrûpayê giştî, li Tirkiyê de helwest û êrîşên desthiltiya faşîst ya AKP û R.T Erdoğan ku li arasteyî şoreşgeran, welatparêz û dijberan giştî dike, baş dizînin. Bi rastî jî ji ev koçberên polîtîk ku ji aliyê Yewnan ve danin Tirkiyê hinekên wan jî hatine girtin û ketine hepsê.

Li Yewnanîstnê ev salên dawîn de li arasteyî şoreşgerên Tirkiyê û Kurdîstanî êrîş û pêkutî zêde bûne û li arasteyî şoreşgeran êrîşên girtinê berdewam dikin. Serokê kevn yê Komeleya Çanda Tohûm ya Londonê û xebatkarê ATİK Abdûllah Gurlek û xebatkarê rojnameya Pêşeroja Azad û xebatkarê ATİK yê Yewnanîstan Vedat Yeler 13ê meha Rêşemî 2019an de hatin binçav kirin. Du roj di binçav de mane û piştî du rojan hatine girtin. Niha di Girtîgeha Komîtnî de girtî ne û di nav vê qewlê de derneketine pêşîya dadger. Di meha Tirmehê de dîroka danişîna ku ji bo dadgehê da bûn Gurlek û Yeler bêdadgeh paş ve hate avêtinê 20ê meha Rêbendanê sala 2020an.

Nasnameyên polîtîk ên her du şoreşger û çalakîyên wan vekirî ye. Girtî bûn û heta niha derneketina dadgehê ji her du şoreşgerên nasnameyê wanên polîtîk vekirî re rewşek neqebûl kirin e. Ev rewşa girtîtiya dirêj jî jiyandina çopandina mafek din e. Em ji bo piştgirtiya Abdûllah Gurlek û Vedat Yeler bang li raya şoreşger û pêşverûya giştî dikin.

Abdûllah Gurlek û Vedat Yeler Serbest Berdin!

Ji Girtiyên Polîtîk Gişt Re Azadî!

Bijî Piştgiriya Navneteweyî!